Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1077 | 28-Hezîran- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Mêşên hingiv ji bo xwe ji parazîtan biparêzin, xwe ji hev vedigirin

**Zanyaran tespît kirin ku mêşên hingiv di dema gefa parazîtan de xwe ji hev vedigirtin, ku mirov di dema şewba Covid-19 de hewl didin vê yekê bikin.**

li hemberî parazîtên Varroa, beşên hundir û derve yên kewarê ji hev cuda dibin û bi vî rengî jî belavbûna parazîtê tê kêmkirin.

Tîmeke navneteweyî ya ji lêkolînerên ji UCL û Zanîngeha Sassarî ya li



Zanyar pê hesiyan ku mêşên hingiv ji bo parastina kewara xwe ji gefa parazîtên kolonî xwe ji hev vedigirtin.

Çawa ku mirov di dema şewba Covid-19 de ji bo ji hev bi nexweşiyê nekevin xwe ji hev vedigirin, eşkere bû ku mêşên hingiv jî di dema gef û êrişa parazîtan de xwe ji hev vedigirin. Li gorî lêkolînê, bi taybetî mêşên hingiv ên ciwan ku li navenda koloniyê ne û mêşên hingiv ên extiyar ên li derve, hîn bêhtir mesafeyê dixin navbera xwe.

Di dema lêkolînê de hate dîtin ku Îtalyayê mêşên hingiv ên hatin dagirkirin û yên koloniyên wan nîne anî beramberî hev û encamên wê jî li kovara Science Advancesê weşand. Li gorî vê yekê, mêşên hingiv di dema dagirkeriya parazîtan de kombûna li hev (dansa lêgerîna li xwarinê) ne li navenda kewarê gelekî kêm caran kirin. Tîma lêkolînê her wiha tespît kirin ku di dema dagirkeriya parazîtan de mêşên hingiv ên ciwan mêşên hingiv ên extiyar ji navenda kewarê ber bi derve ve dehf didin û bi vî rengî xwe ji hev vedigirin.

# Li Antarktîkayê bi 900 metreyî li binê qeşayê şopa jiyanê

**Li Antarktîkayê, bi kîlometreyekê li binê qeşayê de şopa jiyanê hate dîtin.**

lêkolîna wan gelekî balkêş e û anî ziman, cara yekemîn e li cihekî bi temamî qeşa girtiye jiyan tê dîtin. Di çarçoveya lêkolînê de li binê qeşaye-



Di lêkolînekê de ya li kovara Frontiers in Marine Science hate weşandin, encamên lêkolînên li Antarktîkayê hatin parvekirin. Di vê lêkolînê de ku ji alilyê pisporê British Antarctic Surveyê Huw Griffiths bi rê ve bir, bi 900 metreyî li binê qeşa Antarktîkayê şopa jiyanê hate dîtin. Li binê platformeke qeşayê ya li qadeke ji 1.5 mîlyon kîlometreçargoşeyî belavbûyî, hin cûreyên heywanan hate dîtin ku nediliviyan.

Huw Griffiths diyar kir ku encamên ke mezin tehtekî mezin tê tespîtkirin. Jiyana li bine Antarktîkayê jî li binê vî tehtê li binê qeşayê hate tespîtkirin. Pispor diyar dikin ku li binê qeşa navborî nepêkane ku tîrêjên Rojê xwe bigihîne vê qadê, lê xwegihandina madeyên organîk li cihekî ewqasî kûr, ne ji rêzê ye. Pispor radigihînin ku pirsa 'gelo organîzmayên bi 900 metreyî li binê qeşayê xwe bi çi rengî gihandine wê derê?' pirseke girîng e û di heman demê de dipirsin ku ew organîzma ji kengî ve li wir in?

# Jin hewl didin xwezayê biparêzin

**Jinên Kobanê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi çandina gul û çîçekan hawirdora xwe xweşik dikin, diparêzin ji bo ku şînahî zêde bibe.**

Jin bi awayekî xwezayî bi xweza û çandiniyê ve girêdayî ne. Bi taybetî gul û kulîlk ji bo jinan karên herî xweş in. Jinên Kobanê teqez dikin ku armanca wan bi çandina gulan zêdekirina rûberên kesk û xemilandina bajarê xwe ye.



Der barê armanca sereke ya vekirina şitilgeha Şêran ji bo jinan, endama ofîsa jinê ya li şaredariya navçeya Şêranê ya kantona Kobanê Cîhan Semî got: "Em ji bo pêşxistin û xurtkirina projeyên jinan dixebitin. Şaredariya kantona Kobanê berî 6 mehan projeyek taybet ji bo jinên navçeya Şeranê vekir bi armanca zêdekirina rûberên şîn û derfetên kar ji bo jinan, ji ber ku jinan dest bi çandiniyê kirine hawirdora xwe parastine. Di şitilgehê de gelek cureyên gul, çîçek û daran hene, em sebaran, yasmîn, gardînya, cezanya û hemû cure û rengên gulan li gel darên heracan û darên bi berhem diçînin."

Cîhan Semî diyar dike ku ew hewl didin hejmara xebatkarên di şitilgehê de zêde bikin her wiha hejmara gul û daran û rûbera şitilgehê jî berfireh bikin ji bo hejmareke zêde bixebitin. Jin bi zêdekirina rûberên şîn di bajarê xwe de xweza û hawirdorê diparêzin.

**'Ez gelek ji çandinî û şînahiyê hez dikim'**

Xebatkara şitilgehê ya ji Şêranê Werdê Mihemed Elî ya 40 salî dibêje ku çandina dar û şînahiyan li şitilgehê û malê parçeyek ji jiyana wê ye û dibêje: "Hezkirina min ji karê çandiniyê û xwezayê re zêde ye. Ez hatim min li vê şitilgehê kar kir, ji bo rûberên şîn li bajarê xwe zêde bikim û gulan biçînim bajêr bixemlînim, wisa em dîmenekî ciwan ê rojava biafirînin."

Der barê cureyên gulan de Werdê Mihemed Elî got: "Ez gelek cureyên gul û daran diçînim weke şînahiyên salonan, sebar û gulan ji bo xemilandinê bi kar tînim, girîngiyeke zêde ji bo van gulan, dar û beran pêwîst e ji bo ku mezin bibin. Her roj em giyayên zêde ji şitilgehê radikin û derdixin, herwiha em cureyên gulên xerîb û nû jî li mala xwe diçînin."

Sudoku: Bersiv 86

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 2 | 3 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 1 |
| 7 | 8 | 6 | 9 | 5 | 1 | 4 | 2 | 3 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 3 | 4 | 8 | 7 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 5 | 4 | 8 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 4 | 3 | 6 | 9 | 1 | 8 | 5 |
| 8 | 9 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 | 6 | 4 |
| 3 | 6 | 7 | 4 | 8 | 2 | 5 | 1 | 9 |
| 9 | 4 | 2 | 7 | 1 | 5 | 6 | 3 | 8 |
| 1 | 5 | 8 | 6 | 9 | 3 | 7 | 4 | 2 |


Sudoku:Pirs 87

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 6 | 8 | | | | | | 9 |
| | | | | 4 | | | | 8 |
| | 7 | | 6 | 2 | 8 | 4 | | |
| | 1 | 7 | 9 | | | | | |
| | | 3 | 1 | 5 | 4 | 7 | | |
| | | | | | 6 | 1 | 8 | |
| | | 2 | 8 | 3 | 5 | | 4 | |
| 3 | | | | 6 | | | | |
| 1 | | | | | | 8 | 3 | |

## Quncika Têgînan

| Arîşe | Alozî, pirsgirêk, kêşe, gelemşe, mûşkîle, problem... |
|---|---|
| Aşît/aşût | Şapeya berfê |
| Format (Ingilîzî) | Awa, şekil, reng, şêwe: Pirtûk bi formateke nû çap kir. Bernameya xwe bi formateke cuda çêkir. |
| Form (Fransî) | Teşe, şêwaz, şekil, awa..: Helbestvan helbesta xwe bi formeke nû bi cî kir. |
| Forum (Latînî) | 1. Di dema Roma de qanên ku gel ji bo gotûbêjkirina pirsgirêkan lê kom dibû. 2. Gotûbêjên bi komî. 3. Qadên gotûbêjê: Ragihandin foruma civakan e. |
| Sekvan | Kesê di avêtina gule, yan tîran de jêhatî, kesê li nîşanê dixe. |
| Sekvanî | Karê kesê sekvan: Çalakiyeke sekvanî kir. |
| Şepal | Şêra mê. |
| Zirx | Hesin yan jî tişteke din ya qayîm, ku ji bo zerer negihe mirov yan tiştekî, yan gule û çekin din lê neçin, li wan tên pêçan. |
| Zirxî | Amûr, alav û tiştên bi zirxê hatîn pêçan: Li seyareyeke zirxî siwar bûn. |

# KCK'ê Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr anî



KCK'ê Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr anî, ku di 29'ê hezîrana 1925'an de hatin darvekirin û got: "Weke ewladên Şêx Seîd û hevalên wî, Seyîd Riza û Beseyan, Alîşêr û Zarîfeyan em ê têkoşîna ku wan di oxira wê de canê xwe dane, bi ser bixînin. Em soz didin ku em ê ji xeta xiyanetê hesab bipirsin." **R-3**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1077 | 28-Hezîran- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# 'ZÎLAN XETA JIYANA AZAD E'

Kordînasyona Partiya Azadiyê ya Jinên Kurdistanê PAJK'ê Zeynep Kinaci (Zîlan) bi rêzdarî bi bîr anî û got, "Pêşengiya ji pêvajoyê re ya bi rengê Zîlan, têkbirina tecrîda li ser Rêbertî û misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye."**R-2**




## Li Silêmaniyê pirtûkxaneya jinên Kurd hate vekirin



Li bajarê Silêmaniyê 'Navenda Zanist, Lêkolîn û Arşîvê ya Pirtûkxaneya Jinên Kurd, ku yek ji xewn û projeya Endama Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê Nagîhan Akarsel bû, hate vekirin. Li Başûrê Kurdistanê yekem carek navendek pirtûkxaneya jinên Kurd tê vekirin.**R-7**

## Kar û xebatên Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo




Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo, bi armanca çakkirina rewşa avê li bajêr, di sala 2022'an de, tevî hin astengiyan, 16 piroje pêk anîn û îsal jî 6 piroje xistin nav pilana xwe de.**R-6**

## Evîna dewleta Tirk û Barzaniyan

Çîrokên gelan dibistanên wan in. Li dibistanan çawa ku mirov timî aliyê baş ê serpêhatiyan naelime, ji çîrokan jî carina aliyê ne xweş mirov fêr dibe. Efsaneya Gilgamiş çîrokeke Sumeriyan e. Lê ne tenê serpêhatiyên wan ên baş tê de hene; tecrubeyeke ne xweş ya pêşiyên Kurdan jî heye.



**R-4**

## Li gorî biryara NY'yê tevbigerin, îşkenceyê bi dawî bikin



Bûroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan daxuyanî da û wiha got: "Divê li gorî biryarên tevdîrê yên NY'yê tevbigerin, dawî li vê rewşa agahînegirtinê û sepanên îşkenceyê bînin." **R-3**

**MÎT li nêçîra jinan ne** Zeki Bedran R-5
**Pêdiviya me bi Rêber Apo heye...** Farûk Sakik R-5
**Bi madeyên hişbir jî şerê me dikin** Dilyar Cizîrî R-4

# Zîlan milîtana heqîqetê ye

**Kordînasyona Partiya Azadiyê ya Jinên Kurdistanê PAJK'ê Zeynep Kinaci (Zîlan) bi rêzdarî bi bîr anî û got, "Pêşengiya ji pêvajoyê re ya bi rengê Zîlan, têkbirina tecrîda li ser Rêbretî û misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye."**




PAJK'ê di dewama daxuyaniyê de wiha got;"Xeta me ya azadiya jinê, wate û pênaseya nasnameya PAJK'ê ya ku bûye malê dîrokê û jinê; pêşenga xwe hevrê Zîlan Zeynep Kinaci di sala 27'an a şehadetê de bi biryardariya mezinkirina têkoşînê ya bi ruhê fedaî, bi biryardariya parçekirina sîstema Îmraliyê û pêkanîna şoreşa jinê, bi bîr tînin. Ji pêşengên Tevgera Jinê ya Kurdistanê û şoreşa jinê ya Rojava şoreşgera 38 salan Leyman Siwêş û Yûsra Derwêş a hêja ku bi nasnameya xwe ya welatparêz û têkoşer pêşengî ji avakirina sîstema komunal a demokratîk a gel re kirin, ku li bajarê Qamişlo yê Rojava di êrîşa nemerdane ya dewleta Tirk de şehîd bûn, weke sembola biryardariya li ser azadiya jinê bi rêzdarî bibîr tînin. Mêtingeriya Tirk, hewl dide ya ku DAÎŞ'ê nekarî bike, bi êrîşên îmhayê yên leşkerî, bi zexta siyasî, dîplomatîk û aborî teslîm bigire, tasfiye bike. Di şexsê jinê de bombeyan li îrade û hebûna azadiyê ya civakê dibarîne. Jin wê li her qadê eniya berxwedanê ya li dijî faşîzmê, tekoşînê mezin bikin, ciwan jî wê bi tevlîbûneke çalak hesab ji dewleta Tirk a faşîst û hevkarên wê bipirsin."

**Tekoşîna azadiyê xeta Zîlanê ye**

Di dewama daxuyaniya Kordînasyona PAJK'ê de hate gotin;"Hevrê Zîlan-Zeynep Kinaci felsefeya Rêbertî veguherand ferasta têkoşîn û jiyanê, xeta çalakiyê, rêbaz û taktîkê, nîşan da ku kesek bi tenê dikare rêveçûna dîrokê biguherîne. Hevrê Zîlan-Zeynep Kinaci, pîvana şoreşgeriyê ya jin û mêr ên partîbûyî ye. Hevrê Zîlan sekna çalakiyê û jiyana fedaî ya cewherî ya hişmendiya partîbûyî ye, pîvana tevlîbûnê ya li xeta Rêber Apo ye. Lewma çalakiya fedaî ya ku hevrê Zîlan li dijî hêzên artêşa Tirk pêk anî, ne tenê çalakiyeke leşkerî ya serketî ye. Rêber Apo weke çalakiyeke leşkerî nenirxand, ji wê jî wêdetir şîrove kir, bi partîbûna jinê wate û qîmet da peyam û banga hevrê Zeynep Kinaci ya ku di nameya xwe de destnîşan kir. Rêber Apo ev pêngava dîrokî ji bo têkoşîna azadiyê ya jinê weke xet û rastiya Zîlanbûyînê Pênase kir û di 8'ê Adara 1998'an de Îdeolojiya Rizgariya Jinê ragihand, bi damezrandina Partiya Jinê tacîdar kir ku wê bibûya bedena manîfestoya me ya azadiya jinê. Rêber Apo ku hîndekarê rastiyê ye û kesayetiya Zîlan ku milîtana heqîqetê ye, ew îrade û berxwedan e ku sîstema olperest, zayendîperest, netewe-perest, serweriya mêr diguherîne, jiyana demokratîk û azad bi rêxistin dike, diparêze û mayinde dike. Xeta 'JIN JIYAN AZADÎ' ya ku îro bûye malê cîhanê, nirxê gerdûnî yê xeta bi rengê Zîlan radixe pêş çavan. Li dijî dîktatorên dijminê jinê û rêxistiniyên faşîst, pêşwazîkirina pêvajoyê ya bi rengê Zîlan, bi bicihanîn û serxistina pêngava me ya 'JIN JIYAN AZADÎ, BER BI ŞOREŞA JINÊ VE' dibe.

**Bi rêbazê Zîlanê tecrîdê têk bibin**

Ji jiyan û şerê li ser xeta Zîlan metirsiyên hêzên sîstema kapîtalîst ên li ser Rêberê me dikarin bêne têkbirin. Pêşengiya ji pêvajoyê re ya bi rengê Zîlan tê wateya têkbirina tecrîda li ser Rêbertî û misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Li dijî dewleta Tirk a faşîst ku bi sîstemkirina tecrîdê pîvaneke nû li hiqûqa cîhanê bi cih kir, bi bilindkirina asta têkoşînê em dikarin edaleta rasteqîn bi cih bînin. Li hemberî welatên Yekîtiya Ewropayê û saziyên navneteweyî ku ji bo berjewendiyên xwe xwedî li berpirsyariyên xwe dernakevin û hiqûqê binpê dikin, şert e ku mirov bi ruhê Zîlan tevlî Pêngava 'Dem dema azadiya Rêber Apo ye' bibin û bi ser bixînin."

# Rêwîtiya 83 salan ji Nînewayê ber bi Xabûrê ve

**Xena Yûnan dapîreke 83 salî ye ji gundê Til Şamîran e lê li navçeya Til Temirê dijî, ji me re behsa rêwîtiya jiyana xwe dike û dibêje ku ew li ser vê axê ji dayik bûye wê li vir jî bimîne û bijî.**

Hesekê- Du gel û çarenûseke hevpar gelê Kurd û Aşûrî, li seranserê dîrokê heya roja me ya îro ji aliyê hêzên hegemonîk û bi taybetî dewleta tirk a dagirker ve rastî polîtîkayên hovane yên qirkirin û nijadperestiyê tên. Her du gel ji kevintirîn netew in li ser axa Mezopotamyayê jiyane û xwedî li çand û dîroka xwe derketine û hebûna xwe parastine. Aşûrî ji Colemêrgê heya Nînowaya Iraqê û Sûriyeyê hatine lê rêwîtiya wan her bi şer re rû bi rû maye. Carna bi şûran carna jî bi darvekirin û çekên giran. Ji her alî ve şerê wan tê kirin û dixwazin wan biqedînin û koka wan ji cîhanê hilînin. Çawa Kurd ne Kurdên berê ne, Aşûrî jî wiha ne Aşûriyên îro ne wekî duh in. Gelek malbatên Aşûrî li navçeya Til Temirê ya Kantona Hesekê-Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn. Xena Yûnan yek ji wan dapîran e ku li navçeyê tevî kurekî wê yê nexweş dijîn. Xena 83 salên xwe li vir derbas kiriye, vê carê me xwest rêwîtiya wê bizanibin û bi xwendevanên xwe re parve bikin.

**Ji zarokatiyê ve stûna malê bû**

Xena Yûnan di destpêka axaftina xwe de behsa kok û zarokatiya xwe dike û dibêje: "Em bi eslê xwe ji Iraqê ne lê ez bi xwe li gundê Til Şamîran hatime dinyayê. Her wiha li Til Temirê jî zewicî me keçek û 4 lawên min hene, yek ji wan nexweş e niha tenê ez û wî li malê dimînin. Min ji zaroktiyê ve ji dibistanê hez nedikir, her ku min dişandin ez direviyam. Paşê dema ku hinekî ez mezin bûm min pembo çand û avdanî kir. Ji ber bavê min wefat kiribû, birayên me jî tune bûn, xwişka min a mezin zewicî bû û tenê ez û ya biçûk mabûn. Me genim jî diçand û min traktor diajot û erd cot dikir. Berê jî patos tunebûn, me bi dasê genim radikir. Di saetên êvaran de jî bêra min li ser milên min bû û min avdanî dikir. Heya niha tê bîra min ji 12 saliya xwe ve min dest bi karê çandiniyê kir û erdên me pir bûn. Di xwezaya min de heye ev tişt ku ez pir ji kar pir hez dikim. Ji bo cîranên xwe jî di rojê de min 7 çêlek didotin ji bo ku mast û şîr bifroşin."

**Têkiliyên gelê Kurd û Aşûr**

Xena Yûnan behsa têkiliya Kurd û Aşûriyan dike û vî tiştî dibêje: "Piştî ku ez zewicîm û hatim Til Temirê min Kurd nas kirin û êdî em bi hev re jiyan. Niha ez herim ku derê jî cîran û nasên me yên Kurd gazî min dikin û em civatan li dar dixin. Ji bo min ferqa Aşûriyan ji Kurdan tune ye, hemû jî wekî zarokên min xwişk û birayên min in. Di şîn û şahiyan de em li kêleka hev in her wiha di cejnan de jî em serdana hev dikin. Li vir 50 sal zêdetir e em bi hev re dijîn."

**Rêwîtiya jiyana me bi komkujiyan re derbas bûye**

Xena Yûnan got ku rêwîtiya wan ji Tirkiyeyê dest pê kir ber bi Iraqê ve hatine û li Sûriyeyê bi cih bûne û wiha dirêjî da gotinên xwe: "DAIŞ'ê di sala 2015'an de êrîşî gundên me kir û gelek ji malbat û mirovên me revandin, paşê hatin berdan. Her wiha gund hemû talan kirin û xirab



kirin, di heman wextê de jî dêrên me teqandin. Ev çeteyên DAIŞ'ê ji ku derê derketin, bûn belayê serê me em nizanin. Aşûriyên li Tirkiyeyê rastî êrîşan hatin, berê xwe dan Iraqê li wir jî nefilitîn vê carê berê xwe dan Sûriyeyê. Li vir jî xweşî nedîtin, dîsa bi êrîşan re rû bi rû man. Jiyana me bi komkujiyan derbas bûye, ji dapîrên me bigre heta bigihîje me."

**"Li kêleka avjeniyê ez masîvaneke pir zîrek bûm"**

Xena Yûnan behsa çend bîranînên xwe yên ku hê ruxmî temenê wê yê mezin di bîra wê de ne dike û dibêje: "Ji te re behsa çi bikim û çi nekim. Min dar çandine, baxçe çêkirine, genim çandiye û avdanî kiriye û traktor ajotî ye, ev hemû ne gotin in lê belê di van gotinan de gelek bîranînên min hene. Li ber qiraxên çemê Xabûrê gelek darên cuda hebûn, av diherikî û her der şîn bûbû. Lê niha bûye axa sor, çem miçiqî ye û av êdî naherike li kêleka koçberiya çend malbatên Aşûrî. Gelek caran lehî radibû û av heya ber mala me dihat. Em niha bi hesreta wan rojan in. Berê piştî ku me xwarin dixwar, em diketin nava çemê Xabûrê, me avjenî dikir. Min ev ji bîr kiribû; li kêleka avjeniyê min masî jî digirtin, ez masîvaneke zîrek bûm û 7 sinareyên min jî hebûn. Me av bi bîdonan li ser pişta xwe dikişand malê. Niha Xabûr zuha bûye, tenê axa sor maye. Mirovek ji derve were lê binêre, wê nas neke ku ev der Xabûr e, cihê vejandina jiyanê. Du caran ez çûm ser Xabûrê, min rojên berê anîn bîra xwe, têra xwe geriyam û hatim. Tiştek ji destê me nayê, niha çem miçiqiye."

**"Ez ê li vir bimînim"**

Xena Yûnan bal kişand ser koçberiya li derveyî welat û ev tişt anî ziman: "Ger ku min li vir bikujin jî ez dernakevim derveyî welat û dest ji Sûriyeyê bernadim. Ger ez derkevim derve jî ziman nas nakim, civaka wir jî xerîb in û danûstandinên wir jî kêm in. Em ê çi sûdê ji derketina xwe bigrin, herî kêm li vir têkiliyên civakî hene. Heta mirovên hev naçin û nayên cem hev li wir. Her saetek li vir hêjayî Emerîka, Avustralya, Kaneda û Elmanyayê ye. Hebûna min li vir bes e. Ez li vir dijîm, ez ê li vir jî bimînim û hebim."



# Li Silêmaniyê pirtûkxaneya jinên Kurd hate vekirin

**Li bajarê Silêmaniyê 'Navenda Zanist, Lêkolîn û Arşîvê ya Pirtûkxaneya Jinên Kurd, ku yek ji xewn û projeya Endama Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê Nagîhan Akarsel bû, hate vekirin. Li Başûrê Kurdistanê yekem carek navendek pirtûkxaneya jinên Kurd tê vekirin.**



Îro li bajarê Silêmaniyê bi amadebûna hejmarek berçav ya jinan Navenda Zanist, Lêkolîn û Arşîvê ya Pirtûkxaneya Jinên Kurd hate vekirin.

Navend di çarçoveya projeyê de xebatên ji bo veguheztina berhemên jinên cîhanê ji bo nifşên paşerojê. Herwiha wê di navendê de berhemên nivîskî, devkî, mîtolojîk, helbestî, dengbêjî û xêzkirina jinên Kurd ên ji dîrokê heta niha bêne meşandin. Niha zêdetirî hezar û 800 çavkanî û pirtûkên nivîskarên jin yên di hemû warên cûda de hene.

Di merasîma vekirinê de gelek nivîskar, çalakvan, parêzerên mafên jinan û kesayetên her çar parçeyên Kurdistanê û welatên din amade bûn. Di merasîmê de gelek kesan peyamên pîrozbahiyê weşandin, herwiha gelek pirtûk û karên xwe pêşkêşî navendê kirin.

Hêjayî gotinê ye armanc ew e ku ev navend bibe pirtûkxaneyek ji berhemên ku têkoşîn, hilberandin, çand û hişmendiya jinan ji demên berê heta niha li Kurdistanê nîşan bide û navendek arşîv û bîranînê ye ku ne tenê berhemên nivîskî, lê yên dîtbarî û bihîstinî yên jinên kurd tê de werin berhevkirin û parastin.

Endama Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê, rojnameger û akademîsyen Nagîhan Akarsel di 4'ê Cotmeha 2022'yan de li Silemaniyê ji aliyê MÎT'a Tirk ve hate qetilkirin.

Xewn û projeya Nagîhanê ya avakirina Navenda Zanist, Lêkolîn û Arşîvê ya Pirtûkxaneya Jinên Kurd pêk tê. Navend îro bi tevlîbûna jinên ku ji Rojhilata Navîn û Ewropayê hatin bê vekirin.

Nagihan Akarsel

Nagihan Akarsel bi nasnav Heval Zîlan, jinek lêkolîner û rojnamevan bû. Di sala 1976'an de li gundê Xêlîkan a ser bi bajaroka Gulyazî ya girêdayî bajarê Konyayê hatiye dinê. Tevayî jiyana xwe bi dirûşma 'Jin jiyan azadî' ji bo têkoşîn û xebata jinê veqetand. Roja 4'ê Cotmeha 2022'yan di encama êrîşa çekdarî ya MÎT'a Tirk de li taxa Bextiyarî ya Silêmaniyê li nêzî mala xwe hat şehîdxistin.

# Têkiliya Edebiyat û dîrokê

Ji serdema herî kevin a nivîsê ku tê zanîn ve, wekî remz û rênasiyekê nivîs bûye rêbera mirovahiyê. Wekî ku tê zanîn, zanista herî kevin ango bi awayekî dî, zanista herî kevnar û berfireh felsefe tê zanîn ku hemû zanistên din di bin banê xwe de dihewand. Paşê yeko yeko beş û binbeşên zanist û hunerê jê qetîne. Li ser vê şopê em dibînin rêka gelek displîn û beşan jî heta asteke diyar bi hev re ne. Bêyî ku em ji sernavê nivîsa xwe dûr bikevin, divê em bidin zanîn heta sedsala 19'an dîrok jî di bin banê edebiyatê de, wekî binbeşek edebiyatê heta wê demê hatiye. Ji ber hin taybetiyên xwe yên xweser, bi demê re dîroknasan hem barê xwe ji ser milê wêjeyê girtine hem jî rêkek taybet ji xwe re vekirine. Mînak gelek in lê ya herî navdar ku dîroka kurdî de berhema Ehmedê Xanî mesnewiya "Mem û Zîn" sala 1692'yan de bi îlhameke mîtolojî bi awayekî modern û menzûme nivîsiye, Xanî ji dema xwe berhemek bi zanyarî, ji dil, bêqisûr û xurt teswîr kiriye ku heya vê çaxê bi mayînde li ber dilê edebiyatê, çi detayan em ê nebinîn ku bi zimanê çaxa xwe çîrok xistiye qalibekî mişexes teswîr kiriye. Em li wir jî hîs dikin û dibînin tehma dîrokî di kakilê edebiyatê de çawa hatiye parastin. Çimkî her çiqas herdû displîn jêderka wan felsefe be jî, xaçerêka tê de diborin ji hev ne cuda ne. Hest, raman, felsefe, derbirîn, rasterast xweza, rewşa bi her awayî ya mirovî û çîroka di nava demê de ya mirovahiyê. Bi awayê herî kurt mijara edebiyatê bûn. Lê piştî sedsala 19'an çîroka di nava demê de ya mirovahiyê ku îro em wekî dîrok dizanin ji edebiyatê diqete û wekî dîsplîneke serbixwe rêka xwe didomîne. Ji ber bihevrebûna wan a bi sedan salan têkiliya di nava wan de jî gelekî grîft û tim li ser piyan e.

Ev têkilî wisa xurt û asayî ye ku dema zanista dîrokê rastî tu belgeyek dîrokî ya zanista xwe neyê yekcar berê xwe dide tekstên edebî. Loma jî heta vê demê, wekî belgeyên pêbawer



zanista dîrokê pişta xwe bi rehetî dispêre berhemên edebî. Her çiqas berhemên edebî, berhemên tevnsaziyê bin jî di paşxaneya xwe de, ji serdema xwe, ji dema afrînerê xwe, bûyerên serdema xwe şopên beloq li xwe dihêlin.



Ji ber van sedeman dema em bala xwe didin roman, çîrok, şano, helbest û fîlmên dîrokî em pêrgî şopên wê serdemê tên. Loma jî dîrok û edebiyat bi qasî şopeke nas nêzî hev in. Dema em li berhemên edebî dimeyzînin, her çiqasî dema her berhemekê cuda be jî dîsa her berhem şop û şîfreyên dema xwe di nava xwe de dihewîne. Wekî destpêka şano jî serdema berê ya yewnanan tov digre, mijar û hemû hunerên şano çawa û li ku dest pê kiriye di dîrokê de kêm zêde em dikarin texmîn bikin. Ji ber vê taybetiya girîng a edebiyatê, displîna dîrokê tu caran ji edebiyatê neqetiyaye û ew ji xwe dûr jî nexistiye. Çimkî berhemek edebî çiqas hewl bide xwe ji tişt û geremola rojane dûr bixe jî, wan remz û sembolên roja xwe bikar tîne.

Bifikirin ku romanek derbarê şerê Kûbanê de hatiye nivîsîn di sedsala 21'an de, ew ê çiqasî xwe ji wê serdemê û bûyerên wan deman dûr bixe? Yan jî romanek derbarê şerê rizgariya vêtnamê de bifikirîna; Romanûs dikare çiqasî dûrî rastiyê be, çiqasî tevnsazî be jî ew bi kod û şîfreyên di nava xwe de qala wê serdemê bike. Yan jî berhemeke edebî ya otobiyografîk bifikirin ku çavkaniyek çawa ye ji bo siberojê, Belkî jî ji ber vê yekê ye dîrok û edebiyat nikarin dûrî hev bisekinin. Her çiqas berhemên wê serdemê berhemên tevnsazî bin jî, bi hemd yan jî bê hemdê xwe şopên serdema xwe bi awayekî gelekî xurt li xwe dihêlin. Bi van xisûsiyetên xwe edebiyat dibe çavkaniyek xurt ji bo dîrokê. Bêguman dîrok, bûyerên qewimî jî, her rojek dîrokî jî dibin rêyek ji bo berhemên edebî. Dema ku em van bi hev re bidin ber hev û ser hev, dîrok û edebiyat dibin du destbirakên hev ên hunerî û zanistî. Çimkî edebiyat jî ji bo ji paşxaneya dîrokî ya metna xwe, ya hunermend û wê serdemê sûdê werdigire. Ew roman, çîrok, şano, helbest û fîlmên dîrokî ku em dikarin wekî dîrokî qal bikin jî jixwe bingeha xwe ji wê derê digirin.

Têkiliya edebiyat û dîrokê bi qasî xwe bigihîne serdema arkaîk kûr û xurt e. Ji bilî van xalên ku me qal kir, sînorê vê hevkariyê bi berhemên cuda yên huner û çandî yên postmodernîst bêhtir berfireh bûye. Gelek sînor û xweseriya herdû dispilîn bêhtir xumam kiriye. Piştî dabeşbûna felsefeyê, du beşên sereke û gelekî nêzî hev û tim di têkiliyeke xurt de, wekî jêderk û çavkaniyên hev dîrok û edebiyat tim hev xwedî dikin û mezin dikin. Herdû beşên zanistî/hunerî jî jêderka wan mirov in loma ji hev re tim palpişt in û hev zindî dihêlin.

Weke gotina dawî heger em bala xwe bidin dîrokê, divê em di ser dîroka edebiyatê re derbas nekin. Çimkî dîroka edebiyatê, bi sedsalan li ser berhemên edebî yên wê civakê kûr dibe, li gorî serdeman berheman dinirxîne, bi cih dike û wekî belgeyan pêşkêşî dîrokê dike. Ji ber vê yekê jî bi saya berhemên edebî em kelepora xwe ya dîrokî jî nas dikin. Bi saya van berheman em feraseta ramanî û helwesta rojane ya mirovî ya civaka xwe jî bi awayekî dîrokî fam dikin.

# Kar û xebatên Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo

**Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo, bi armanca çakkirina rewşa avê li bajêr, di sala 2022'an de, tevî hin astengiyan, 16 piroje pêk anîn û îsal jî 6 piroje xistin nav pilana xwe de.**

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo yek ji saziyên ji bo pêşkêşkirina xizmetguzariyên têkildarî ava welatiyên bajêr e. Sazî bi giştî, 50 karmendan di nav xwe de dihewîne û hêjayî gotinê ye ku hertim ji bo başkirina rewşa ava bajêr di nava xebatê de ne. Herwiha pirojeyên girîng û mezin jî ji bona vê yekê dikin nav pilanên xwe de.

Li kantona Qamişlo sê meheteyên ji bo komkirin û belavkirina avê hene, ya herî mezin; meheteya Hilêliyê ye û hjmara bîrên avê yên ku ev mehete avê jê werdigere 51 bîrên avê ne û kûrahiya van bîran ji 400 heya 500 mitran e. Herwha meheteya Ewêca jî avê ji 10 bîran werdigre û meheteya Ceqceq jî ya 3`yan e û 3 bîr jî avê didin vê meheteyê. Ev hemû mehete avê ber bi 3 xalên rawestand û belavkirinê ve tînin û 2 karmend ji bo belavkirina avê ber bi bajêr ve hatine erkdarkirin.

Di heman demê de jî xetek avê ji derveyî Qamişlo tê, ku xeta Sefan yek ji xetên avê ya ku alîkariyê bi meheteyên bajê re dike. Ev xet ji gundê Xanaserê heya Qamişlo bi riya boriyên 600 m.m(مل متر) ) taybet yên avê re, tê. Herwiha ji bilî vê xeta avê û 3 meheteyan,13 bîrên din jî li taxa Cûdî, Cirnik, Qidûrbeg û Umfursan jî hene.

Herwiha vê Gerînendeyê di 2022`yan de gelek pirojeyên mezin bi dawî kiriye, li gor rêveberiya wê ji Rojnameya Ronahî re diyar kir, derket holê ku Gerînendeya Avê ya Qamişlo ji sala 2022`yan heya niha, 14 pirojeyên avê bi dawî kirine û nêzî 40 hezar dolar li van pirojeyan çû.

Li gor rêveberê Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo da destnîşankirin pirojeyên wan yên sala 2022`yan



jî ev bûn:

1:Da pirsgirêka ava beşek ji taxa Siyahî were çareserkirin,vê Gerînendeyê li taxa Siyahî 2 rêgarên avê yên nû çêkirin, 2 sikrên îtalî yên nû bi cih kirin û herwiha xeteke avê bi dirêjahiya 15 m kişand ser wan rêgar û sikran û ev pirsgirêk jî çareser bû.

2: Guherandina 4 sikrên bi yên îtalî nû, li gelek taxên bajarê Qamişlo.

3: Guherandina xeta avê ya li nik Gaziya Lazgîn Arif bi xeta avê ya bolitrîn. Herwiha dirêjiya vê xetê jî 200 m bû.

4: Guherandina xeteke avê, li taxa Erbewiyê.

5: xeteke serke ya tora avê ya kevin ku ew xet ya hesinê zêbeq bû hat rahêştin û di şûna wê de, xeteke nû ya bilastîk hat bi cih kirin. Ji ber ku li gor rêxistinên tendirustî yên Cîhanî, ev bûriyên hesin di demeke kurt de tev zingar digrin û ava ku dide jî nepaqij e, lê yên bilastîk, bi 10 qatî ji boriyên hesin çêtirin.

6: Berfirehkirina xetên avê yên taxa Zihûr.

7: Çêkirina boriyeke xeta avê ya serke ya bajarê Qamişlo.

8: Çêkirina boriya xeta sereke ya taxa Elaya.

9: Guherandina xeta li bakurê Dadgeha Qamişlo.

10: Guherandina xeta sereke ya başûrê çerxerêya Qiwetlî.

11: Berfirehkirina xetên avê yên taxa Cûdî.

12: Çêkirina xeta sereke ya li cem çerxerêya Qiwetilî.

13: Çêkirina xeta sereke ya li cem çerxerêya Rojhilat(Şerq).

14: kirîna 2 ototransatên(terens) ji bo ceyrana her 13 bîrên li taxa Cûdî, Qidûrbeg, Umilfursan û Cirnikê.

Ji bo îsal jî 6 piroje di nav pilanên Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo de ne. 2 piroje di nav kar û xebata Gerînendeyê de ne û di meha Tîrmehê de jî wê bi dawî bibe û herwiha 4 pirojeyên din jî wê di dema bê de werin despêkirin.

1: Guherandina sîstema ceyrana




bîra Ebû Bekir Elsedîq ya li taxa Cûdî ji ya awayê ceyrana jenetoran bi ya ceyrana normal ku bi şev û roj ceyran li ser bîrê qut nebe. Herwiha wê 15 hzar dolar wê lêçûna vê pirojeyê be û ev piroje di demeke nêz de wê bi dawî bibe.

2: Avakirina xezaneya 3`yan ya li meheteya Hilêliyê, berdewam e ev xezane jî dikare 3000 m.m av vehewîne. Herwiha 800 hezar dolar wê li vê pirojeyê here û wê di meha Tîrmehê de jî bi dawî bibe.

3: Mezinkirina tora xeta avê ya taxa Hilêliyê, dirêjahiya wê jî 1070 mitire ye, wê 10 hezar û 116 dolar li vê pirojeyê here. Ji bo munaqeseyê vî karî jî bi riya Şaredariya Qamişlo hatiye raghandin.

4: Mezinkirina tora xeta avê ya taxa Xerbî, dirêjahiya wê jî 516 mitir e, wê 6 hezar 562 dolar li vê pirojeyê here. Herwiha ji bo munaqeseyê jî bi riya Şaredariya Qamişlo hatiye raghandin.

5: Mezinkirina tora xeta avê ya taxa Cûdî, dirêjahiya wê jî 168 mitir e, wê hezar û 685 dolar li vê pirojeyê here. Herwiha ji bo munaqeseyê jî bi riya Şaredariya Qamişlo hatiye raghandin.

6: Bi cihkirina xeteke avê ya nû li bakurê çerxerêya Osman Sebrî heya çerxerêya Şehîd Yûsiv Gulo, herwiha hîna ev piroje di bin lêkolînê de ye û ji bo munaqeseyê nehatiyê ragihandin.

**Kar û xebata Gerînendeya bajarê Qamişlo**

Têkildarî pirojeyên avê yên Gerînendeya Ava bajarê Qamişlo ya sala 2022 û 2023`yan û astengiyên wê, rêveberê Gerînendeyê, Wasil Eseed ji Rojnameya me Ronahî re axivî.

Wasil da zanîn ku ji sala 2022 heya 2023`yan gelek piroje ji bo başkirina rewşa avê pêk anîne û wiha destnîşn kir: " Em weke Gerînendeya Ava bajarê Qamişlo, bi hemû karmendên xwe ve hertim ji bo çareserkirina pirsgirêkên avê yên bajarê xwe kar û xebatê dikin. Herwiha avê jî rojane û bi awayekî sîstematîk ji çar jêderan didin gel û saziyên nava bajêr. Di heman demê de jî ger pirsgirêk kete xetên avê yên hin malan an jî saziyan û da ku bê av nemînin, em avê bê pere bi sêtîrên xwe ji wan re dibin. Di sala 2022`yan de, gelek pisgirêk li ser asta bajêr hebûn, me jî ev pirsgirêk baş lêkolîn kirin û ev pirsgirêk kirin nava pilan û pirojeyên xwe de. Hêjayî gotinê ye ku me 14 piroje di sala bûrî de bi dawî kirin û pirsgirêkên avê yên sala 2022`yan tev çareser kirin. Herwiha îsal 6 piroje jî di nav xebata me de ne û di mehên bê de jî wê werin temam kirin."

**Astengiyên di kar û xebatê de**

Rêveberê Gerînendeya Avê ya bajarê Qamişlo Wasil Eseed di dwiya axaftina xwe de diyar kir ku di kar û xebatên ji bo başkirina rewşa avê de, hin astengî derdikevin pêş û wiha got:"Em di pirojeyên xwe yên sala 2022`yan de rastî hin astengiyan hatin, weke pirsgirêkên ku di bagra me de çêbûn. Ev bagra ne dixebitî û li werşeyên çêkirinê ye, herwiha ev kar tev bi bagrayekê nameşe, ji ber vê yekê pêwîstiya me bi yeke din jî heye. Herwiha erebeyke JKA tenê jî ji bo kar û xebatê li cem me heye, ew jî pirî caran nayê bikaranîn ji ber ku xera dibe. Wekî din jî dema ku pisgirêkeke avê li Qamişlo derdikeve, em neçar dibin ku avê bi sehrîcê bibin û belav bikin, niha tenê yek sehrîc li cem me heye, lê tenê sehrîcek avê ji bo vî bajarî têrê nake, lewma pêwîstiya me bi sehrîcên din jî heye."

# Jin derfetên kar û xebatê diafirîne

**Komîteya aboriya jin li bajarê Hesekê yê Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê daxwazên jinan ên bingehîn bi cih tîne bi riya projeyên xwe mafên wan diparêze.**

Endama komîteya aboriya jin Tirkiyê Sîdo teqez dike ku ev komîte bi riya projeyên xwe derfetên kar ji bo jinan diafirîne ji bo ku pêdiviyên xwe bi cih bîne û tevli bazara kar bibe.

Komîteya aboriya jin li kantona Hesekê li herêma Cizîrê alîkariya jinên li herêmê dike û derfetên kar ji hejmareke zêde jinan re bi riya projeyan peyda dike.

Di vê derbarê de, endama komîteya Kongra Star a kantona Hesekê Tirkiyê Sîdo dibêje ku jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rokeke girîng di hemû waran de dilîzin di serî de di warê aborî de beşdarî projeyên xizmeta wê û civakê dibe û got: "Gelek projeyên me yên taybet ji bo jinan hene weke projeyên çandiniyê û koperatîf. Gelek jin hene pêdiviya wan bi kar heye kes alîkariya wan nake, komîte derfetên kar peyda dike di werşeyên dirûtinê de, kargeha conserve, ava bacanan zêdetirî 30 jin kar dikin di demsala havînê de jî ev hejmar zêde dibe. Herwiha ew jin di firinan de jî kar dikin weke firna Şadadî û Hesekê di her yekê de 5 jin hene."

**Jin bi keda destê xwe debara jiyanê dike**

Derbarê projeyên pêşerojê yên komîteya aboriya jin de Tirkiyê Sîdo wiha got: "Komek proje tên lêkolînkirin weke projeyên çandiniya sebzeyên havînê û projeya vekirina cihê şûştina ferşan. Bi kordînekirina bi meclisan re, civîn ji bo jinên dixwazin kar bikin û pêdiviya wan gelekî heye tên li-



darxistin, piraniya jinên ku sûd ji projeyên me girtine jinên Serê Kaniyê û Girê Spî ne ku herêmên wan di bin dagirkeriya Tirkiyeyê de ne. Lewre piraniya wan civînan li kampên penaberan tên lidarxistin. Dahata projeyên çandiniyê, yên werşan, kargehan û firnan digihîje jinên karker û dabeşî hev dikin.

**Derfetên kar ji bona jinan hatine peydakirin**

Endama komîteya aboriya jinê Tirkiyê Sîdo di dawiya axaftina xwe de,da zanîn ku ev proje derfeteke baş e ji bo jinan, dikarin aboriya xwe pê ava bikin û alîkariya malbata xwe bikin û got: "Aboriya jinê piştgiriya jinan di warê moralî û darayî de dike. Divê hemû jin tevlî kar bibin û alîkariyê ji kesê nexwazin. Ji bo jinên ku derfetên kar nabînin deriyê komîteya aboriya jin li pêş wan ji bo kar vekiriye."

**JINHA**



# Li gorî biryara NY'yê tevbigerin, îşkenceyê bi dawî bikin

**Navenda nûçeyan**

**Bûroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan daxuyanî da û wiha got: "Divê li gorî biryarên tevdîrê yên NY'yê tevbigerin, dawî li vê rewşa agahînegirtinê û sepanên îşkenceyê bînin."**

Gerînendeyê Giştî yê Tele1'ê Merdan Yanardag tev li bernameyeke televîzyonê bûbû û tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan rexne kiribû. Nîqaşên ser gotinên Yanardag didomin. Bûroya Hiqûqê ya Sedsalê têkildarî mijarê daxuyanî da.

Bûroyê bi bîr xist ku têkildarî gotinên Yanardag ên "Tecrîda li ser Ocalan tê ferzkirin di hiqûqê de nîne. Divê were rakirin. Malbat û parêzerên wî jî nikarin pê re hevdîtinê bikin. Gelo ma pergaleke înfazê ya wiha dibe?" lêpirsîn hatiye destpêkirin û wiha hat gotin: "Lê di esasê xwe de hewceye têkildarî rejîma tecrîdê ya li Îmraliyê û kesên vê rejîmê birêve dibin de lêpirsîn were destpêkirin. Hevdîtina bi malbat û parêzeran re, mafê herî xwezayî yê birêz Abdullah Ocalan e. Lê bi sedemên derqanûnî tên astengkirin. Tu agahî ji birêz Abdullah Ocalan, birêz Omer Hayrî Konak, birêz Hamîlî Yildirim û birêz Veysî Aktaş nayên girtin."

**'Sepanên ne rewa'**

Bi domdarî di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Mîna statûya taybet a Îmraliyê, her wiha astengkirina azadiyan jî cureyên îşkenceya li Îmraliyê ye. Ev 27 meh in tu agahî ji birêz Ocalan û miwekîlên me yên din nayên girtin. Têkiliya wan a bi cîhanê re hatiye qutkirin û têkildarî rewşa wan a tenduristiyê tu agahî li ber destê me nînin. Ev yek, merheleya herî bilind a îşkenceya li Îmraliyê ye. Pir eşkere ye ku tişa nerewa ev sepane ne.

**Ocalan nûnertiya azadiyê dike**

Divê neyê jibîrkirin ku êrişên li dijî mafên şexsî yên miwekîlên me jî eleqeya xwe bi van polîtîkayan heye. Berevajî atmosfera ku dixwazin ava bikn, birêz Ocalan nûnertiya azadî û demokrasiyê dike û ev yek ji hêla bi milyonan mirovan ve hatiye eşkerekirin. Di salên 2006-2007'ê de li Tirkiyeyê bi daxwaza azadiya birêz Ocalan zêdetirî 3 milyon kesan îmze pêşkêşî TBMM'ê û di sala 2013'an de jî zêdetirî 10 milyonan kesan îmze pêşkeşî Konseya Ewropayê kirin.

**Divê sepanên îşkenceyê bi dawî bibin**

Li dijî rewşa li Îmraliyê, me di sala 2022'yan de serî li Komîteya Mafên Mirovan (KMM) a Neteweyên Yekbû



(NY) da. Di encama vê serlêdanê de KMM NY'yê di 6'ê îlona 2022'yan de bersiv da û biryara tevdîrê ji hikûmetê re ragihand. KMM NY'yê biryara tevdîrê ya 'Divê bêyî ku astengiyeke were derxistin, tavilê bi parêzerên xwe re bikare hevdîtinê bike' di 19'ê çileyê de dîsa bi bîra hikûmetê xist. Li gel ku hikûmet berpirsyar e ku li gorî vê biryara navneteweyî tevbigere jî, em dibînin ku hêj bi vê biryarê nekiriye. Bi vê biryarê nehatiye kirin û bi domandina tecrîdê re sûcê biqesdî xerab bi kar anîna peywirê hatiye kirin û bi vî sûcî re sûcê îşkenceyê hatiye kirin. Banga me ya ji bo hikûmet û Wezareta Dadê ev e; tavilê li gorî biryara tevdîrê ya KMM NY'yê tevbigerin û dawî li rewşa agahînegirtinê û sepanên îşkenceyê bînin."

# KCK'ê Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr anî

**Navenda nûçeyan**

**KCK'ê Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr anî, ku di 29'ê hezîrana 1925'an de hatin darvekirin û got: "Weke ewladên Şêx Seîd û hevalên wî, Seyîd Riza û Beseyan, Alîşêr û Zarîfeyan em ê têkoşîna ku wan di oxira wê de canê xwe dane, bi ser bixînin. Em soz didin ku em ê ji xeta xiyanetê hesab bipirsin."**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê ji ber salvegera şehadeta Şêx Seîd û hevalên wî daxuyaniyek weşand ku di sala 1925'an de ji aliyê dewleta tirk ve hatin darvekirin. KCK'ê diyar kir ku gelê kurd wê Şêx Seîd û şehîdên din tu carî ji bîr neke û got, "Bi navê Tevgera Azadiyê ya Kurd, di salvegera darvekirinê de em Şêx Seîd û hevrêyên wî careke din bi bîr tînin. Weke ewladên Şêx Seîd û hevalên wî, Seyîd Riza û Beseyan, Alîşêr û Zarîfeyan em ê têkoşîna ku wan di oxira wê de canê xwe dane, bi ser bixînin. Gelê Kurdistanê wê li dijî her cûre planên tasfiyekirinê û êrîşê yên desthilatdariya AKP-MHP'ê li ber xwe bide, têkoşînê hîn mezin bike, nehêle ku polîtîkayên qirkirina kurdan bi ser bikevin, mêtingeriya qirker û xiyaneta hevkarê wê têk bibe."



**' Dewleta tirk bi bidarvekirina Şêx Seîd komkujiyeke mezin kir'**

Daxuyaniya KCK'ê bi vî rengî ye: "Dewleta tirk a mêtinger, bi bidarvekirina Şêx Seîd û hevalên wî 29'ê Hezîrana sala 1925'an komkujiyeke mezin kir. Di şexsê Şêx Seîd û hevalên wî de, em şehîdên şoreş û demokrasiyê hemûyan bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin, careke din soz didin ku em ê dilsozê bîranîna wan bin û têkoşîna wan bi serkeftinê tacîdar bikin.

Şêx Seîd û hevalên wî li ber înkarkirina kurdan, neheqî û xiyanetê rabûn ku ji aliyê dewleta tirk ve hate kirin û ji bo azadiya kurdan têkoşiyan. Di her şert û mercî de têkoşiyan û heta bi hetayê bi nirxên têkoşînê ve girêdayî man. Li dijî gefên darvekirinê yên rejîma qirker û dijminê kurdan, helwest nîşan dan û raxistin pêş çavan ku bi xurtî dilsozê doza Kurdistanê ne. Têkoşîna Şêx Seîd û hevalên wî ji bo gelê Kurdistanê gelekî bi wate û hêja ye ku canê xwe feda kirin. Gelê kurd wê ked û fedakariya wan a ji bo vê dozê û bîranîna wan tu carî ji bîr nekin.

**'Peymana Lozanê bû destpêka komkujiyên ser gelê kurd'**

Bi Peymana Lozanê re ku beriya sed salî hate mohrkirin, dewleteke nû li ser tirkîtiyê ava bû, Kurdistan hate parçekirin û li dijî gelê kurd pêvajoya înkar û îmhayê destpê kir. Dewleta ku li ser tirkbûnê ava bû, qirkirina kurdan ji bo xwe kir armanca bingehîn. Bi vê armancê li Kurdistanê polîtîkayên asîmîlasyon û qirkirinê xiste dewrê, nasname, ziman û çanda gelê kurd qedexe kir, nasnameya tirkbûnê li gelê kurd ferz kir. Bêguman gelê kurd ev zilm û neheqî qebûl nekir û li dijî vê zext û ferzkirinê li ber xwe da. Lê belê dewleta tirk jî bi rêya tundî û komkujiyan xwest vê yekê bide qebûlkirin. Mîna Şêx Seîd û hevalên wî gelek rûspiyên kurd li ber parçekirina Kurdistanê, zilm û neheqiya li gelê kurd rabûn. Dewleta tirk jî ev yek ji xwe re kir hincet û li Kurdistanê dest bi komkujiyan kir. Ji xwe di sala 1925'an de ji ber ku Şêx Seîd û hevalên wî li ber vê neheqiyê rabûn û daxwaza mafên gelê kurd kirin, dewleta tirk dest bi êrîşê kir, Şêx Seîd û hevalên wî yên dozê yên ku daxwaza azadiya gelê kurd dikirin, bi dar ve kirin û komkujiyeke mezin kir. Bi vê yekê re li Kurdistanê pêvajoya komkujiyan hate destpêkirin. Darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî raxist pêş çavan bê dewleta ku nû ava bûye xwedî karakterekî çawa ye, bi çi rengî nêzî kurdan dibe. Rêber Apo diyar kir ku bi êrîşên ku di Sibata 1925'an de hatin destpêkirin û bi darvekirina Şêx Seîd re qirkirina kurdan hate destpêkirin.

**'Mîsyona AKP-MHP'ê qirkirina kurdan e'**

Dewleta tirk a mêtinger qirker hîn jî xwedî karakterê xwe yê dijminatiya li kurdan e û qirkirina kurdan hîn jî ji xwe re kiriye armanca bingehîn. Di vê serdemê de ev polîtîka bi destê desthilatdariya AKP-MHP'ê ya faşîst tê meşandin. Desthilatdariya AKP-MHP'ê dixwaze Qirkirina Kurdan a ku bi Peymana Lozanê bi rengekî fermî destpê kir, di sedsala duyemîn de bibe serî. Di bingeha feraseta AKP-MHP'ê ya li ser sedsala Tirkiyeyê de ev rastî heye. Ya ku bi esasî planên dewleta tirk têk bir, rabûna Rêber Apo û PKK'ê, destpêkirina têkoşîna azadiyê ye. Bi têkoşîna ku bi pêşengiya tevgera me destpê kir, pêşî li dewleta tirk a mêtinger qirker hate girtin ku polîtîkayên xwe yên qirkirina kurdan nebe serî û hebûna gelê kurd ji nû ve hate misogerkirin. Dewleta tirk ku fêhm kir, heta Tevgera Azadiyê ya Kurd tune nebe wê kurd neyên qirkirin, ji hingî ve hemû hêza xwe seferber kiriye ji bo Tevgera Azadiyê ya Kurd tasfiye bike. Bi vê armancê tifaqa AKP-MHP'ê ya faşîst hate avakirin û li ser desthilatdariyê hate danîn. Mîsyona bingehîn a ku li pêşiya AKP-MHP'ê hatiye danîn ew e ku tevgera azadiyê tasfiye bike û kurdan qir bike.

Bi navê Tevgera Azadiyê ya Kurd, di salvegera darvekirinê de em Şêx Seîd û hevrêyên wî careke din bi bîr tînin. Weke ewladên Şêx Seîd û hevalên wî, Seyîd Riza û Beseyan, Alîşêr û Zarîfeyan em ê têkoşîna ku wan di oxira wê de canê xwe dane, bi ser bixînin. Gelê Kurdistanê wê li dijî her cûre planên tasfiyekirinê û êrîşê yên desthilatdariya AKP-MHP'ê li ber xwe bide, têkoşînê hîn mezin bike, nehêle ku polîtîkayên qirkirina kurdan bi ser bikevin, mêtingeriya qirker û xiyaneta hevkarê wê têk bibe."

# Pêşwazîkirina Cejina Qurbanê

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Şêniyên Qamişlo ji ber bihabûna kel û pelan gelek zahmetiyan dikşînin û gotin, bi hatina cejnê barê me girantir dibe.**

Ji ber buhaya nirxê dolar li hemberî lîreya Sûrî, nirxê kel û pelan li tevahiya Sûriyê, di nav de li herêmên bakur û rojhilatê Sûrî gihiştiye asteke bilind, bi hatina cejna Qurbanê jî bihabûn hîn bilintir bûye.

Derbarê pêşwazîkirina cejna Qurbanê û bihabûna kel û pelan, welatiyên bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

Welatiyê bi navê Ferhan Hevsikî yê ji bajarê Serêkaniyê ye û ev 4 sal in li bajarê Qamişlo bi cih bûye, derbarê pêşwazîkirina cejna Qurbanê wiha got: "Cejn ji bo me weke rojên normal derbas dibe, di demên borî de berî hatina cejnê bi hefteyekê şêranî û hazirtiyên cejnê dihat kirin. Lê mixabin coş û moral nemaye ji ber ku zehmetiyên jiyanê zêdetir bûne."

Ferhan Hevsikî wiha dawî da axavtina xwe û got:" Em bi hêvîne ku rewşa gel a aborî baştir bibe û em tev alîkariya



hev bikin, Cejina Qurbane li hemû gelan pîroz kir."

Ciwanê bi navê Ferhad Xalid yê 13`e salî, diya kir ku berê di cejnan de, ew tevî xuşk û birayên xwe li malê kom dibûn û wiha domand: "Mixabin niha malbata min ji hev belav bûye. Dema niha mirov nema dikare cilan bikre, buhayê cilê zarokekî biçûk zêdeyî 300 hezar lîreyê Sûrî ye. Dibe ku derfetê min hebin ku ez ji xwe re cil û bergan beyda bikim, lê gelek zarok derfetê wan nîne, hin malbat jî hijmara zarokên wan zêdene û 4 melyon lîre jî têra wan nake."

Ferhad di dawiya axaftina xwe de banga pêkanîna daxwaziyên zarokan kir û cejn li tevahiya zarokan pîroz kir.

Welatiyê bi navê Bîlal Xelef ku ji bajarê Qamişlo ye da zanîn ku Cejna Qurbanê, ji bo zarokan cihê kêfxweşiyê ye û wiha pê da çû: "Tiştê xweş di vê cejnê de ew e ku hin kes xwarin û goşt li kesên feqîr belav dikin. Berê me du sê hefte berê xwe ji cejnê re amade dikir û her tim di cejnê de qurbanî didan. Lê ji ber bihabûnê êdî ji gelek kesan nayê guşt bikrin.

Bîlal banga alîkariya bi hevre kir û wiha qedand:" Pêwîste Malbatên dewlemend di cejnê de bi malbatên xizan re alîkar bin û dilê wan şadbikin.

# Evîna dewleta Tirk û Barzaniyan

**Volqan Elî**

Çîrokên gelan dibistanên wan in. Li dibistanan çawa ku mirov timî aliyê baş ê serpêhatiyan naelime, ji çîrokan jî carina aliyê ne xweş mirov fêr dibe. Efsaneya Gilgamiş çîrokeke Sumeriyan e. Lê ne tenê serpêhatiyên wan ên baş tê de hene; tecrubeyeke ne xweş ya pêşiyên Kurdan jî heye.
Gilgamiş qralekî Sumerî ye. Piştî ku li Mezopotamiya jêrîn şaristanî ava dibe ji bo dagir bike berê xwe dide welatê (daristan) Humbaba (pêşiyên Kurdên îro). Bi berxwedanê re rû bi rû dimîne. Di destpêkê de Enkîdo jî xwe teslîm nake. Gilgamiş têk diçe. Paşde vedigere. Lê belê ji fêlbaziya dest bernade. Di dawiya dawî de Gilgamiş, Enkîdo dixapîne û dixe xizmeta xwe de. Êdî hêza Enkîdo ne bi civaka xwe re ye, dibe xayinê qewmê xwe.
Gilgamiş bi rênîşandana Enkîdo gelek dewlemendiyên bin erd û ser erd, kole ji xwe re digre û dixwaze êdî vegere welatê Sumeran. Lê Enkîdo, qewmê xwe, welatê xwe baş nas dike. Dizane heger Hûmbaba têk neçe, jê re rehetî tineye. Ew ê bibe pêşengê berxwedanê û jê hesabê xiyanetê bipirse. Ji ber vê yekê diçe hizûra Gilgamiş û jê rica û tika dike ku ew Hûmbaba bikuje. Naxwe qewmê Arî wê êrîşê bîne ser Sumeran. Li ser vê yekê Gilgamiş dikeve daristanê (Kurdistana îro), talan dike û Hûmbaba dikuje.
Ruxmî ku di ser re bi hezaran sal derbas bûye, çîroka îxanetê nehatiye guherîn.
Neha, em ê ji we re behsa îxaneta Mala Barzanî û KDP'yê nekin. Jixwe tê zanîn. Tenê em dixwazin behsa taybetmendiyeke îxanetê bikin;
Sendroma (ezme) Enkîdo!
Em li efsaneya Sumeran vegerin: Zilam (Gilgamiş) qralekî mezin ê Sumeran e. Talanê dibe ser qewmê wî (Enkîdo) wî dîl digre. Welatê wî serûbin dike. Piştî serkeftina xwe dixwaze vegere. Lê Enkîdo dibe evîndarê dijminê xwe; li ber digere ku kokê qewmê wî biqelîne. Em niha jî berê xwe bidin serdem û



Enkîdoyê muasr: KDP û malbata Barzanî.
Di 6'ê Sibatê de li Kurdistan, Tirkiyê, Sûriyê erdhejeke mezin çêbû. Bi sed hezaran mirovan jiyana xwe ji destdan. KCK agirbest îlan kir. Divê mirov mafê dijminê xwe jî nexwe! Dijminê herî baş ê Kurd û gelên Rojhilata Navîn Tayip û artêşa wî ye. Ruxmî ku KCK'ê agirbes ragihand, bi balafir, tang û topên xwe yek kêliyê jî nesekinî û bê navber her dever bombebaran kir. Bi sedan gerîlayên azadiyê şehîd ketin.
Di 14 û 28'ê Gulanê de hilbijartin li tirkiyê û bakurê kurdistanê çêbûn. Bi dekûdolaban dîsa Tayip hate ser desthilatiyê. Yek ji yên ku di destpêkê de Tayip pîrozkirin jî, mala Barzaniyan bû.
Li herêmên Parastinê yên Medyayê dagiriya ku sê sal ji beriya vê dest pê kiribû li sengerên pêş ên ZAP'ê asê mabû. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê jî, artêşa Tayip, dem bi dem êrîşên mezin pêk dianîn, hin caran bi riya firokên xwe yên bê mirov û ajanên xwe êrîş dikir. Hin caran ji ber berxwedana gelan zilma wî wekî li ZAP'ê asê mayî li hemberî êrîşên şervanên azadiyê nikare li berxwe bide û tar û mar dibe. Lê tayip him ji ber hilbijartinê, him ji ber berxwedana gel a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û him ji ber hesabên xwe yên cuda asê xetimî mabû.
Vê yekê bala KDP û Barzaniyan jî kişand. Diviyabû gurên boz ên Baxçeli û Tayip dest bi êrîşan bikirane. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê gelên Ereb, Kurd, Aşûr bi rengekî azad xwe bi rêxistin dikin û li Herêmên Medyayê gerîla di nav tevgereke mezin de ye. Bi taybetî li Rojava berê, beşekî civakê girêdayî mala Barzanî bû, lê êdî ti kesî pirsa wan nake. Bila êrîş bikirana, kokê gelên azad biqelandana! Hezar carî Rehmet ji xayintiya Enkîdo re ji ber ku îxaneta wan hemû sînorên heyî derbaskirin.
Di heman rojên ku li Astanayê piroja şer û fêlbaziyê dihate danîn; Mala Barzanî rojek nekir du roj di cih de Mesrûrê kurê Mesûd berê xwe da Enqerê. Da li ser şopa bav û kalên xwe. Jixwe Mela Mistefa çi gotibû; "divê em ti car xwe ji dewleta Tirk dûr nexin". Hê Mesrûr Barzanî li Enqerê di bin dawa Tayip da bû, li Rojava du jê jinên Kurd (Yusra ûRîhan) ên pêşeng, û Firat Tuma ji gelê Aşûr ji aliyê balafirên bê mirov ên dijminê gelan ve hatin qetlkirin.
Ti kêmasî û gunehê wan tinebû. Heger hebe sûcekî wan ew jî dema YPG û QSDê şerê DAIŞê dikirin wan jî, ji bona parastina axa xwe li gel QSDê cihê xwe di berxwedaniyê de digirtin; DAIŞ'ê jî pêşmergeyên dîl girtine di qefesan de şewitandin; li Ewropa û Emerîkayê bi dehan car DAIŞ'ê êrîşê gel kirin û bi sedan kes gulebaran kirin, li Rojhilata Navîn gelek komkujî li ser gel pêkanîn û bi taybet jî li ser gelê Êzîdî.
Dê vê carê hûn bêjin di demeke wisa de çi karê Barzaniyan li Enqereyê hebû ma ne pêwîst bû ku li cem gelê xwe be û djî dagirkeriyê bisekne û birînên gelê xwe dermanbike?



## Bi madeyên hişbir jî şerê me dikin

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 26'ê Hizêranê de (Roja Cîhanî ya Tekoşîna li dijî Madeyên Hişbir) Hêzên Ewlekariya Hindir ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê encama xebatên xwe yên tekoşîna li dijî madeyên hişbir bi daxuyaniyekê çapemeniyê li Reqayê aşkere kir. Di daxuyaniyê de detayên berfireh û hejmara şebeke, bazirgan toreya kesên teşwîqa bikaranîna hişbiriyê dikin û kesên belav dikin û kesên bi kartînin, ên hatine girtin aşkere kir.
Di kêliya destpêkê de dema min daxuyanî guhdar kir û dîmen dîtin, matmayî mam û gelek xalepirs di serê min de geriyan. Min wiha ne dixwest bawer bikim ev hejmarên mezin ên bi madeyên hişbir ve mijûl in di herêmên me de çêbûne. Lê dema ez li rewşa herêmê vegeriyam û êrişên li ser herêmê yên ji gelek aliyan têne meşandin di cih de min feriq kir, mijara belavbûna madeyên hişbir, ne mijara pere qezenckirinê tenê ye. Mijar mijareke siyasiye û navendên istixbaratê bi hemû hêza xwe li pişt şebekeyên belavkirina madeyên hişbir û teşwîqkirina wê de ne. Bi hemû hêza xwe dixwazin ciwanên herêmê bi madeyên hişbir ve girê bidin. Wiha jî wan dûrî nirx û baweriyên wan bixin.
Ji ber wê jî hejmarên di rapora salane ya hêzên Asayîşê de hatin diyarkirin, mezin in. Ew şebeke û kesayetên derqanî yên bi madeyên hişbir re mijûl dibin ji aliyên istixbarata hin aliyan ve têne rêxistinkirin. Baş xuya dike, şerê herêmê bi madeyên hişbir jî beşekî êrişên dewleta Tirk ên bi top, tang û balafirên bê mirov û şerê taybet e. Li vir dema em dibêjin dewleta Tirk, wê hinek bêjin ma rêjîma Şamê û komên çekdar ên girêdayî wê jî li Dêrazorê gelek kargehên kaptagonê vekirine. Bi riya sîxur û zilamên girêdayî xwe di herêmê de belav dikin.
Bi van madeyan hewl didin ciwanên herêmê bikin armanca êrişên xwe û planên xwe yên li ser herêmê pêk bînin. Planên wan ên çêkirin, teşwîqkirin, bazirganî û bikaranîna van madeyan di herêmê de mezine. Li pişt plana dewleta Tirk di herêmên dagirkirî de navenda hişbiriyê bikar tîne. Hikûmeta Şamê û hêzên girêdayî wê jî bi armanca êrişkirina herêmê van madeyan teşwîq dikin. Di heman demê de niha hikûmeta Şamê, Îran û komên girdayî wan di riya madeyên hişbir re him êrişî herêmê dikin û him jî qezencên madî ji xwe re bi dest dixin û wiha li ser xirakirina nifşekî destkeftiyên xwe didin pêş.
Em behsa bobelatek mezin li ser hemû şêniyên herêmê û cîhanê beleye. Pêwîste tekoşîna zanistî ya li dijî wê jî derkeve asta herî jor. Lê tişta li ber çavan diyar dibe, hejmarek mezin a saziyên navdewletî li herêmê hene, lê heta niha me ne dîtiye tu aliyan ji wan ji bo alîkariya hêzên ewlekariya hindir di tekoşîna li dijî madeyên Hişbir kar û xebat dane meşandin.
Ji ber wê jî di vê rewşa metirsîdar a belavkirina madeyên hişbir, pêwîste civak baldar be, hemû hêza xwe li dijî madeyên hişbir û belavbûna wê di herêmê de seferber bike û tekoşîna li dijî madeyên hişbir derxîne asta herî jor.

## `Rêveberiya Xweser tirs xistiye dilê dewleta Tirk a dagirker`

Cîgirê Hevseroketiya Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Yasir Silêman destnîşan kir ku encamên civîna Astana ne li gor berjewendiyên gelê Sûriyeyê ne û piştrast kir ku serkeftina Rêveberiya Xweser di parastina herêmê de û beyannameya wê ya dawî û biryara darizandina çeteyên DAIÇ'ê, tirs xistiye dilê dewleta Tirk a dagirker.

Dewleta Tirk a dagirker di dema dawîn de êrişên xwe yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê giran kirin, di 20'ê Hezîranê de balafira bêmirov a biçek a dewleta Tirk a dagirker êrişek li dijî herêmê pêk anî di encamê de Hevseroka Meclisa Kantona Qamişlo Yusra Derwêş, cîgira hevseroketiyê Leyman Şiwêş û endamê meclisê Firat Tûma şehîd bûn.
Cîgirê Hevseroketiya Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser Yasir Silêman destnîşan kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmê di çarçoveya êrişên bi armanca guhertina demografiya herêmê û dagirkirina xaka Sûriyeyê de ne.
Silêman got: "Her tim berî civînên ku tê de Tirkiye, Rûsya û Îran dicivin dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe girantir dike. Ew civîn jî tu carî ne li gorî berjewendiya gelê Sûriyeyê bûn, berovajî wê ew rê dide dagirkeriyê nexasim di çarçoveya lewazkirina hikumeta Şamê de."
Silêman destnîşan kir ku gelek nêzîkbûnên herêmî û navneteweyî li herêmê hene, her wiha gelek guhertin û lihevkirinên siyasî jî hene ku tu carî ne li gorî berjewendiya gelê Sûriyeyê ne, bi taybetî jî ew lihevkirinên bi dewleta Tirk a dagirker re ya ku dixwaze kirîza xwe ya hundirîn derbasî derdorê bike.

**'Darizandina çeteyên DAIŞ'ê tirsê dixe dilê dewleta Tirk a dagirker'**

Silêman wiha lê zêde kir: "Beyannameya çareseriya kirîza Sûriyeyê




ya ku Rêveberiya Xweser ragihandiye û biryara darizandina çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tirs xiste dilê dewleta Tirk a dagirker û hişt ku ew êrişên xwe li dijî herêmê girantir bike."

**'Tirkiye û Rûsiya hewil didin destekê bidin hikumeta Şamê'**

Silêman wiha domand: "Dewleta Tirk a dagirker hewl dide ku li ser kêndiran bilîze; carekê xwe dide aliyê Amerîka û carekê jî berê xwe dide Rûsyayê, ku Rûsya jî dixwaze bi rêya rejîma Sûriyeyê dest deyne ser bîrên petrolê yên Sûriyeyê. Bêguman ev mijar tevlihev e, ji ber ku ew ne li gor îradeya gel a herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye."
Silêman di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku serkeftina tecrubeya Rêveberiya Xweser di parastina yekitiya xaka Sûriyeyê de hişt ku Rûsya û Tirkiye li dijî wê bisekinin û desthilata rejîma Sûriyeyê vegerînin, her wiha ajandeyên xwe jî li herêmê pêk bînin. **ANHA**



# Ji bo avakirina cîhaneke baştir

**Rêber Hebûn**

derketin ji komê û serkêşiyê li hember wê derî vekir ji guhertina naverokî re, bi palpşitbûna li ser nûbûna ramanan û jîndariya wan, û nepejirandina xwe ji oldarî, pîrozkirin û bişanhildanê û tiştê bi awayê wê ji dîmenên alîgiriyê ve girêdayî, ev bişanhildana ji ez re ji meraqa kûr ji derbaskirina pevbendiyê re vedigere, yê ku mirov dihêle bibe alavekî ji bîraweriya mirovî bi tiştan ve derketî, berhinde nabe ji civakê rojhilata navî ku li pey Ewrûpiyan bikeve berve takekesiyê ve bi awayekî kevinşopî, berhinde pêdiviyê ew dayîna rewşenbîrî û hizrî hebe ji bo temamkirina vê hewildanê, û guherîn pêwîstiya xwe bi naverokekî wêrek û guherbar ve heye û bi girîngiya wê bawer e, û ev yeka wê bi zehmetî wê pêkwere bi kêmanî di wê devera barketî de yê ew armancekî sitratîcîk e kevin e ji çavbirçiyan re bi hatinên wê, û ew raberî û berketî ku di zîndanên alîgirtin û guhdanê de dimînin,û dibin şerekî bêsînor, ji ber vê yekê pêwîst e ku civak bi aliyê bîrdoziya yeksaniyê ve here, û pêdiviya xwe bi girîngiya zanîn û jiyana azad a hevseng ve heye, berhinde zanyar pala xwe li ser bijardeyekî baştir didin bi karîbûna wan ku bên e girêdan bi wê takeksiya dijî ezeziya neyînî derdikeve bi baweriya



wan bi binema malbata şad yê ku stona wê evîn û jêhatîbûn e, ji bo ezberkirina rehetiya henas yê dibin jêdera geşiya mirov û bilindiya wî, berhinde zanistvanê aborî a Nemsawiyê zanyar Firêdêrik Fun Hayik 1 1899- 1992 di pirtûka xwe de (rêya li koletiyê) dibêje:
(Ji bo avakirina cîhaneke baştir, divê em wêrekiyê bi destxwexin ji bo rabûna bi destpêkeke nû, divê em astengiyan ji holê rakin, yên ku hovîtiya mirovan di rêya me de dema dawî dagirtibûn, û divê em jî hinirên baş yên li cem takekesan berdin, binema rêvebir di her hewildanekê de ji bo afirandina cîhanekê ji mêrên azad divê wisa be: Siyaseta rizgarkirina takekes ewa tek siyaseta pêşvero a rastîn e.)
1- Firêdêrik Ûgust Fun Hayik, xelata dostên şehnaziyê û hevaliya ekadîmêka Birîtanî di 08.06.1899-23.03.1992 de wergirtibû, bi tîpên navê wî yên yekem hatibû naskirin F.E.Hayik, ew bîrnas, zanistvanekî aborî Nemsawî Birîtanî ye, bi piştgiriya xwe ji lîbraliya kevinşopî re navdar e.
Em ji rastiya girtinheviya ramanî ewle nabin yê ku pişt re me bi rêve dibe ji berzbûna ez û çûna wê bi aliyê vê serxwebûnê yê ku li ser rewşa xwe derbirîn dike wekî rêyekê ji tenahiyê û hestbûna bi bêpariyê ji hezkirina mêr û jin bi hevdû re yekgirtî ji bo zarokan, ji ber ku takekes pêdiviya xwe bi lihevhatina malbatê heye, ji ber ku ew bingeheke ji avakirina wî ye, di malbateke ked dide bi lêkolînkirina wê û pişt re avakirina wê bi rêya têgihiştin û baweriya ku şadî li ser dostaniyê cîgir e, û zanîn bi girîngiya yekîtiya mirovan û balabûna wan bi peywendiyê ew rêyeke ji têgihiştina hebûnê yê ku hêz û hunerên xwe ji dostaniya mirovan ne ji pevçûn û girtinheviyê distîne,û divê em di rû mirin û tirsê rawestin ji ber ku herdû cihê xwe di hundirê me de digrin di kêliyên tenahiyê û kêliyên awerte de, berhinde hewildana takekes ji yekgirtinê bi dijê xwe re di zayendê de ew hewildana ji bo hêz û şahiyê ye, û derbaskirina hestê neman û sawê ji wê tenahiyê ye, yê ku koçberiyê tîne, berhindê Funhayik diyar dike ku ji bo serpereştiya jiyana baştir divê ew kelem bên e jinavbirin yên ku ji bo astengkirina jiyanê hatine avakirin ji bo rêgirtina hunerên ji bo geşepêdana jiyanê dixebitin.



## MÎT li nêçîra jinan ne



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk, li Rojava bi SÎHA'yan hertim derdikeve nêçîra mirovan. MÎT mirovên ku bi xebatên xwe yên istixbaratî dişopîne qetil dike. Ev êriş ji Şengalê bigre hetanî Silêmaniyê, li tevahî axa Kurdistanê dimeşîne. Di rewşek asayî de, welatek li axa welatek din sûc bike, li dijî hiqûqa navnetewî û zagonên welatan e. Di vî alî de dema hinek operasyonan jî pêk bîne veşartî dihêlin û nagirin ser xwe. Lê rêveberiya Tirk a faşîst, MÎT'ê kar ji hedê wî derxistiye. Li ber çavên cîhanê, li axa welatek din bi awayek peryodîk mirovan qetil dike û bê minet digre ser xwe.
Ev bêpewrebûna faşîzma Tirk ji ku tê? Diyare ku, ji çavgirtin û hevkariya DYE, Rûsya û dewletên din ên li herêmê tê. Dibêjin Tirkiye me guhdar nake, em nikarin pêşiya wan bigirin, ev tenê ji bo hevkariya xwe ya berbiçav veşêrin dibêjin. Kesên ku rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê dizanin, fêm dikin ku ev parastin ji bo xapandina raya giştî ya cîhanê tên kirin. Ev ax ne di sînorên axa Tirkiye de ne. Tirkiye nikare bêje ev pirsgirêka min a navxweyî ye. Heman demê de herêmên ku em qala wan dikin, qada wê ya hewayî di nava DYE û Rûsyayê de parvekirî ne û parastina wê girêdayî wan ne. Li qada hewayî ya di bin parastina DYE û Rûsyayê de ne gengaze bê destûra wan balefirên Tirk bikevin qadê.
Ji bo qetilkirina rêveberên Kurdan û lewazkirina berxwedanê lihevkirinek heye. DYE ji xwe xwedî li rêveberiya xweser dernakeve. Ji ber ku Tirkiye endamê NATO'yê ye naxwaze têkiliyên xwe yên bi Tirkiyê re xirab bike. Bihêzbûna tevgera Kurd û bidestxistina mafê xwe ji wî re ne pirsgirêk e. Rûsya û Îran jî lewazbûna Kurdan li gor berjewendiyên xwe dibînin. Kurdan li dijî dewleta Tirk bikar tînin û tawîzan digirin. Heman demê de dagirkeriya Tirk jî li dijî Kurdan bikar tînin, ji bo gavê paş de bidin avêtin û Kurd radestî rêveberiya Şamê bibin hewl didin. Derdê kesê yê aştî û demokrasiyê tune ye.
Dewleta Tirk hîn di serî de xwest şerê Kurdan ên li dijî DAIŞ'ê reş bike. Tu caran negot Kurdan li dijî DAIŞ'ê şer kirin, berdêlên giran dan û xizmet ji mirovahiyê re kirin. Dema şerê li dijî DAIŞ'ê diket rojevê, dewleta Tirk zimanek silek bi kar dianî û digot "Bikaranîna rêxistinên terorê li dijî hev xelet e". Dema ragihandina cîhanê şerê QSD'ê û jinên Kurd ên li dijî DAIŞ'ê dît û ragihand, dewleta Tirk jî reşkirina vî şerî domand. Rêveberiya qirker a Tirk dibêje, "Em alîgirên yekbûna axa Sûriyê ne. Ji bo yekîtî û istiqrara Sûriyê pêwîste rêxistinên terorê ji wir werin paqijkirin". Qesta wî QSD û Kurd in. Armanca wî ew e ku Kurdên li Sûriyê di qirkirinekî re derbas bike û ji holê rake. Ji derveyî Kurdan, tu şerê Tirkiyê bi tu rêxistinên terorê re tune ye.
Em hertim dibêjin faşîzma Tirk li gorî zagonên şer tev nagere, her xirabiya ku sûcê şere dike. Li Efrîn û herêmên din ên dagirkirî, tu sûc nema ku li dijî jinan, xwezayê û gelan nekiriye. Tê zanîn ku qadên gerîlla yên wek Zap û Metînayê bi awayek rêkûpêk çekên kîmyewî û çekên qedexekirî bikar tîne. Ji ber bêdengiya NY û saziyên din ên navnetewî, bi saya erêkirinên wan ên veşartî, xirabî û sûcên dewleta Tirk li cem wî kar dimînin.
Dewleta Tirk li ser zemîna qirkirina gelan hat avakirin. Di mijara înkar û tunekirinê de heta dawî bi ceribandin e, pijayî ye. Ermenî, Rûm, Asûrî di qirkirinê re derbas kirin. Tiştek nema neanîn serê gelê Ereb. Ev sed sale li ser Kurdan jî heman planên tunekirinê dimeşînin. Rûbirûyê sûc û rastiyên xwe yên dîrokê nabin. Kurd jî înkar kirin. Berxwedanê ev înkara qeba hilweşand, lê têra sekinandina qirkirinê nekir. Her çendî dewleta Tirk nikare bêje Kurd tune ne, lê dibêje mafê Kurdan tune ye. Pirsgirêka dîrokî ya Kurdan û lêgerîna maf a gelekî di têgîna terorê de heps kiriye û vê li cîhanê ferz dike.
Di êrişên dawî yên li ser Rojava de jin û rêveberên rêveberiya xweser hatin hedefgirtin. Hevserokên kantona Qamişlo hatin qetilkirin. Gelê Kurd, gelê Bakur û Sûriyê tevahiyan bertekek xurt nîşan da û meşên protestoyî lidar xist. Di tevahî Kurdistanê de hestiyariyekî ava kir. Tê zanîn rêveberiya Tirk ev xwepêşandan û bertek negirtin dîqetê. Ji xwe ew gelê Kurd neyî dihesibînin, dixwazin tune bikin. Yên xwedî ragihandin vê nateyîsînin gel. Dema bertek bi bandor dibin jî derbasî êrişek dijber dibin û hewl didin ji rê derbixin. Bi temamî weke amûrên şerê taybet dixebitin. Rêveberiya Şamê jî xwedî li gelê herêmên xweser dernakeve. Bûyeran di ragihandina destê xwe de nade nîşan.
Di vî alî de gelê Kurd û dostên wan, divê rêveberiya xweser raya giştî ya derve qasî tê xwestin agahdar bike. Piştî şerê li dijî DAIŞ'ê bi dawî bû gelek derdor ketin rihetiyê. Hinek derdor jî vê bizanebûn belav dikin. Lê rastî ne wisa ne. Heta ku dewleta Tirk dagirkeriya xwe ya li Sûriyê bidomîne û hewl bide aloziyê ava bike DAIŞ ji holê ranabe. Niha xeteriya herî mezin a li ser herêmê dewleta Tirk bixwe ye. Ji bo komkujî û dagirkeriyê li derfetên nû digere. Divê ev rastî bi rêya ragihandin, sosyal medya û rêyên dîplomatîk bi awayek bandor bigihînin gel.

## Pêdiviya me bi Rêber Apo heye…



**Farûk Sakik**

Mirov carna ku ket tengasiyê xwe disipêre tiştekî. Carna mirov xwe disipêre hêzek îlahî, carna rêberek û carna jî xwe dispêre hêza xwe.
Em van rojan pir li Rêber Apo digerin. Em di tengasiyê de ne. Kurdistan di rojên zor û zehmet re derbas dibe. 'Orkestra dijminatiya Kurdan' di bin şeftiya Erdogan de hatiye avakirin. Kî di vê orkestrayê de nîne? Rûsya, Îran, Tirkiye, rejima Şamê û hwd. Kurdistan û Kurd ji her alî de hatine dorpêçkirin.
Li Bakur di pêşengtiya AKP'ê êrişên ser siyasetmedarên kurd, guhertina demografiya Kurdistan, qedexeya li ser çand, huner, ziman û nasnameya Kurdistan derketiye asta herî jor. Ev nirxên bi saya Rêber Apo bidestketibûn, yek bi yek ji dest me diçin. Ji bo vê yekê pêdiviya me bi Rêber Apo heye.
Li Başûrê Kurdistan êrişên ser gerîlayên azadiyê, bikaranîna çekên kîmyewî, li her deverî bicîhkirina îstixbarata xwe dixwaze Kurdistan bê parastin bihêle. Ji bo ku pêşî girtina vê yekê bibe, pêdiviya me bi Rêber Apo heye.
Di sala 2012'yan de statuyek kurdan li Rojava hat avakirin. Tirkiye ji bo vê statuyê ji holê rake, bi Rûsya, Şam û Îranê re ket nav danûsandinan. Siberoj wê were zelalkirin da Tirkiye ka çi bedêl daye.
Ji bo vê yekê em di tengasiyê de ne û li Rêber Apo digerin. Ji bo parastina Şoreşa Rojava pêdiviya me bi midaxlekirina wî heye.
Lozan di sedsaliya xwe de, xwe dubare dike. Sedsal berê di peymana Lozanê de hejmara dagirkeran bû çar. Axa Kurdistan a di bin dagirkeriya Osmaniyan de kirin 3 parçe. Îngilîz û Fransî 2 dagirkerên nû yên Kurdistanê hebûn. Herdu dewletan jî bi Tirkiye re li ser înkara kurdan bazarî dikirin. Dewleta Tirk ji bo Kurd nebin xwedî statu, Îngiliz piştgiriya Kurdan neke, Mûsil û Kerkûk fedakirin. Bi bazariyên gemarî de, li ser tunekirina kurdan li hev kirin.
Wê demê rêberek wek Rêber Apo tunebû ku midaxleyî vê yekê bike. Em ji wî bawer in ku di hemû rojên zor û zehmet de wek gotina fermandarê Kartarca Hannibal, her tim an rêyek didît an jî rêyek vedikir. Mînak piştî 12'ê Îlonê herkesî digot 'ev tevger wê tune bibe' lê wî di nav aloziya Rojhilata Navîn de, gurên hov kedî kirin û tevger hetanî roja me anî. Dema di sala 2011'an de şerê Sûrî dest pê kir, bi paradîgmaya xwe, bi xeta sêyemîn, Kurdistan ji rejîm û çeteyan parast û Şoreşa Rojava pêk anî. Rêber Apo xebatek wî ya mezin jî hewldanên avakirina yekîtiya netewî bû.
Dema ku di sala 1999'an dîl hat girtin, di hevdîtinên destpêkê de banga avakirina Kongreya Netewî kiribû. KNK li ser vê bingehê hatibû avakirin. KNK îroj wek sîwanek an jî navendek yekîtiya Kurdan xebatê dimeşîne.
Îsal salvegera sedsaliya Peymana Lozanê ye. KNK ji bo vê rojê amadekariyek demdirêj daye destpêkirin û li Lozanê wê konferans were lidarxistin. Divê ku di vê konferansê de wê ji bo peymana Lozanê ya sedsal berê berteraf bikin nirxandin û pêşniyar werin kirin. Ji bo azadiya Kurdistan rê û rêbazên têkoşînê werin kirin. Em bawer in ku Ocalan azad bû ya wê karê wan hê bêhtir siviktir bibûya.
Di konferansa Lozanê de, heger nirxandinên ji bo azadiya Kurdistan werin kirin, heger ev pirsgirêkên Kurdan werin tespîtkirin û dema derbasî çareseriyê bibin, wê bibînin ku "pêdiviyek çawa bi Rêber Apo heye"